# Agahî ji bo Temîvanan

Bi karê Temîvanî hûn xizmetêk grîn ya hemwelatîyê tînîn cîh. Ev kar û xizmeta han hûn bi wîjdan û însaf û bir berpirsyarîyek tenê ji bo Temiyan dê bikin.

Ev pergelên kanûnî di derheqê Temîvanîye de di Makekanûna gelî de ne (§§ 1773 bis 1808). Maf û wezîfe ya Temîvanan Temîyan digel van hukmên qanûnan biparêzin: §§ 1631a bis 1632 BGB (§ 1795 BGB). Temîya me li we ye, da kû hûn van maf û qanûnan ji nêzve nasbikin.

Ev xalên jêrîn herî girîngtirin û dibê werin naskirin:

a) Maf û wezîfe ya we ev e û serwet û mal Temîyan biparêzin û temsîl bikin. Li ba karê qanûnû di navbera we da an jî navbera sexsek seyêm de hûn nikarin ev kesan temsîl bikin.

   I. Alîkarîya we, maf û wezîfeya we, Temiyan perwerdekirin, xweyîkirin û cihê wan ên sekinandinê xuyakirin e. Digel vê yekê dibêkû gûn Temiyan li Temîyên zarok didin femkirinê. Di demên girtîna ji bo Girtîgeha hewcedarîya we ji bo mûsada dadgeha malbatê heye.

   II. **Guhdana milk û malê** kesê qasir te erkdar dike, ku tu milk û malê wî bi rêk û pêk birêve bibî û hay jê bimînî û daxwaziya standina hemî mafên xwedîkirinê bo wî bikî.

   Dema tu erkê xwe wek serperişt werdigirî, ji kerema xwe lîsteyekê li gorî nimûneya li ber dest li ser milk û malê kesê qasir çêbike û radestî dadgeha karûbarê malbatê bike û pesend bike, ku ew lîste dirust e û temam e. Eger kesê qasir piştî hingî milk û mal jê re derket, êdî li wê lîsteyê zêde bike.

   Çênabe tu milk û malê kesê qasir ji xwe re bi kar bînî. Û her wiha çênabe tu milk û malê kesê qasir bi diyarî bidî kesekî din. Tenê hingî tu dikarî vî tiştî bikî, dema ev kar ji ber erkekî exlaqî be yan ji ber rêzgirtinê be.

   Divê perên kesê qasir, ku ji bo xerciyên wî pêdivî ne (perên li ber dest) mirov li ser navê kesê qasir deyne ser hisabekî bankê daku her dem li ber dest bin. Û perên din yên kesê qasir, ku pêdiviya wî wek perên li ber dest pê nîne, divê werin hilgirtin (perên hilgirtî), û divê ev pere bi navê kesê qasir li ser hisabekî bankê yê bikhêrhatî bi fayde werin hilgirtin (hisabê bankê yê hilgirtinê). Divê ew bank girêdayî dezgeheke hilgirtina pere ya baş be, ku bikêrhatî be ji bo wî şêweyê hilgirtina pere. Ji bo şêweyekî din yê hilgirtina pere pêdivî bi razîbûna dadgeha karûbarê malbatê heye. Ji kerema xwe ji ber xwe û bê ku dadgeha karûbarê malbatê ji te bixwaze fatûrekê li ser birêvebirina milk û malê kesê qasir çêbike û eger tu biriyarên din li ser vê mijarê nehatibin standin, her sal gelekî dereng di navbera heyvekê de piştî bidawîbûna sala hisab wê fatûrê radestî dadgeha karûbarê malbatê bike. Divê di wê fatûrê de hemî dahat û perên xerckirîn hatibin nivîsandin û birêzkirin. Divê her wiha ji bo hemî dahat û xerciyan belge werin pêşkêş kirin.

   Salê da carekî dibê hûn li ser serweta temîyan agahî bidin dadgeha malbatî.

b) Ji bo hemû karên qanûnî bo temiyan mûsada dadgehê lazim e, li ba van xalan:

   1. li gel amadehîya serbest ya temîyan ji bo karên derve,

   2. li gel karên qanûnî wek ba karên kirîna xanî û erd anjî firotina xanî û mal an jî deynkirina ji naqekî wekî îpotekkirinê,

   3. ji bo karê warîs û mayîna malmîrat an jî keleporîya fermî ya gistî,

4. li gel lêwegerandina malmîratî û keleporên bi peymanî,
5. li gel kirîn, firotan, an avakirin an jî berdana karêk tîcarî wek dukan vekirin,
6. li gel karê kirêkirina mal û avahîya, an jî cêkirina peymanên bi wezîfeya temîyan û li gel peymanên ji salek zêdetir daconê,
7. li gel karê perwerdekirina pise an jî karsazîyê, yê kû ji salek zêdetir berdewam dike,
8. li gel deynkirina pereyan ji alîya Temîyan li ba sazîyekî,
9. Li gel têketina derhûdnameyekî,
10. Ji bo liberhevdana an jî Peymanên dadgehî, ger ev bûhayê dadê ji 6.000,00 Euro derbas bibe. (Ev li ba protokolên nivîsî ên wekhev derbas nabe).

Ev pergal temam nîne. Li ba sikan kerema xwe agahî ji dadgeha malbatî werbigrin. Peymana bê destûr be bandor e. Hûn mecbûrin destûr ji dadgeha malbatî bistînin û bidin hemberê payamnêrê din. Tenê xeberdana vê peymanê têrê nake. Û bi hesandina rîya kesên sêyem ev nayê qebûl kirin. Hûn mecburin bixwe qerar bidin kû peymana we derbas be. Karek yekalî ya dadgehî tenê bi destûra sereke mimkûne.

c) Gûherînên navnîsana Temîyan bê wext derbaskirin bisînîn dageha malbatî û daîreya cîwanan.

d) Dadgeha Malbatî bincavî li hemû karê we dike û ev kar bi alîya daîreya cîwanan ve tê alîkarîkirin û dikare herdem ji we agahî di derheqê Temîyan bixwaze. Daîra Cîwanan û – ger pêwîst be – dadgeha malbatê dikare ji we ra sêwirmendîyê li gel birsyarên we bike.

Kî wek cangorî wezîfeyên xwe bicîh neyne, ew mesûlên hemû astengî û zerara temîyan e. Li hember vê xeterê hûn dikarin xwe li ba dadgeha malbatî pistrast bikin.

e) Karê we dema Temî mezîn û ezeb dibin an jî hûn jî kar werin avêtin xilas dibe. Ji kar avêtina we (merexeskirin) tenê li gel astengîyên gring dibe. Jikarvetîna we li gel daxwaznama Temîyan li gel berjewendîjîyên wan jî dikare çêbe.